

Têkiliya li dibistana te:



Hûn bi xêr hatine

BEŞÊ BIJÎŞKÎ YÊ TENDURISTIYA XWENDEKARAN

li bajarê Landskronayê

KURMANCÎ - KURMANJÎ



Landskrona stad

Layout: MT, Tryck: Kommuntryck Landskrona 2015



Landskrona stad

Tenduristiya xwendekaran li Landskronayê

Di beşê tenduristiya xwendekaran de hemşîreyên dibistanê, kuratorên dibistanê, psîkologên dibistanê, pedagogên taybet û doktorên dibistanan li dibistanên cuda kar dikin.

Di beşê bijîşkî yê tenduristiya xwendekaran de xebatên ji bo pêşvebirina tenduristiyê

Ji xeynî destekdana pêşveçûna xwendekaran a ber bi hedefa perwerdehiyê ve de, beşekî girîng ê karê me ji xebatên berlêgir û xebatên ji bo pêşvebirina tenduristiyê pêk tê. Ji axaftinên bi xwendekaran re bigirin heta bi beşdarbûna xebatên baştirkirina tenduristiyê yê dibistanê, di her çalakiyê de ev cihê xwe digire. Em ji bo şopandina pêşveçûna xwendekaran, parastin û baştirkirina tenduristiya wan û ji bo ew hînî edetên baş ên jiyane bibin kar dikin.

Axaftinên li ser tenduristiyê û vaksîn (aşî)

Sinifa pêşdibistanê: Axaftina li ser tenduristiyê bi xwendekar û dêûbav re, kontrola dirêjî, giranî, dîtî û bistîstinê.

Sinif 2: Kontrola dirêjî, giranî û dîtî. Vaksîna sorik, binguhkî û sorika almanî.

Sinif 4: Axaftina li ser tenduristiyê, kontrola dirêjî, giranî û piştê.

Sinif 5: Vaksîna HPV (Humant Papillom Virus) ji bo keçikan tê pêşkêşkirin.

Sinif 7 an 8: Axaftina li ser tenduristiyê, kontrola dirêjî, giranî û piştê.

Sinif 8: Vaksîn (dîfterî, tetanos, kuxika reş) ji bo zarokên ku piştî sala 2002'an çêbûne.

Sinif 1 a lîseyê: Axaftina li ser tenduristiyê

Di axaftina li ser tenduristiyê de em li ser pirsên tenduristiyê yê weke xwarin, tevgerîn, razan, rehetî û pirsên din ên ku xwendekar dixwaze li ser bisekine diaxivin.

Xebata miayeneyê

Dema lazim be xwendekar dikarin herine miayenexaneyê hemşîreyê dibistanê. Li vir ew dikarin xizmeta weke axaftin, şewirîn û xebatên hesan ên tenduristiyê werbigirin û eger nexweşî û qezayên acil di dema dibistanê de pêk werin hemşîre li van jî dinêre. Beşê bijîşkî yê tenduristiya xwendekaran xebatên berlêgir û pêşvebirina tenduristiyê dike û ku lazim be dikare beşdarî plankirin û hevkarîkirina pirsin li ser lîstîkên xwebixwe ya xwendekaran bibe. Eger lazim be hemşîreyê dibistanê xwendekarên dişîne cihekî din ê lîstîkên tenduristiyê. Bi rêya hemşîreyê dibistanê mirov dikare wext li cem doktorê dibistanê veqetîne.

Tîmê tenduristiya xwendekaran

Berpîrsiyariya beşê bijîşkî yê tenduristiya xwendekaran li ser kompetansa bijîşkî û kompetensa lîstîkên ya tîmê tenduristiya xwendekaran heye. Di vî tîmî de pedagogên taybet, psîkologê dibistanê û kuratorên dibistanê jî hene. Ev tîm li dibistanê ji bo afirandina jîngeheke baş a tenduristî û hînbûnê dixebite. Wezîfeyê vî tîmî jî di zehmetiyên hînbûnê de û di tîştên din ên ku bandorê li rewşa dibistanê dikin de destekdan e.

Xebatên jîngeha kar

Ji bo ku jîngeha kar ji aliyê fizîkî û psîkolojîk ve baş be û ji bo li dibistanan jîngeheke sosyal a kar were afirandin hemşîreyê dibistanê jî beşdarî xebatên dibistanê dibe.

Sirveşartin

Qaîdeya sirveşartinê ya di xizmeta tenduristiyê de ji bo hemşîre û doktorên dibistanê jî lê ye. Ji bo personelê din e di xizmeta tenduristiya xwendekaran de qaîdeyên jidandî yê sirveşartinê hene.

Bi xêr werin!